Nawisk

Ma xelkekê dî jî, wek me festîvalên çand û hunerî dikin?

Tehsîn Navişkî

Raste mafê her gelekî cîhanî ye şanaziyê bi şahsiwar û kenkenên xwe yên çand û hunerî bibe û her kiriyareka ji hejî dikare, ji bû rêzigirtin û rûmetiya wan bikin kiryarek pîroze û dibe li wî çaxî pişkeka kêm ji erkê ser milên xwe rabike. Lê çaxê ev kiryarên hember van senbolên neteweyî werin encamdan, ji sînorên xwe yên normal derdikevin; li wî çaxî gereke mirov bipeyve û ya dilê xwe bi şêwekê şaristanî; wek rexne bêje û sînorekî ji van core kiryarên ne erênî re dabine.

Mîna ez lê meyzedikim, eva îro li herêma Kurdistana rizgarikirî rû dide, dibe berovajiya piraniya welatên cîhana pêşketî be; heke nebêjin li hemû welatên cîhanê tuneye. Çunke daxistina festîval û bîrewerîyên sembolên rewşenbîriya neteweyî, li vir û li wir, hinek kes hene, bi rêkên xwe yên taybet, ji bo hinek meremên gendeliyê bi kar dihînin; heya bikarin bi behana daxistina van core festîvalan bi navê kesanên xwedî dîrokek hunerî û çandî, berjewendiyên xwe yên kesokî pê bi parêzin. Li vê dawiyê geme gehiştî ye wî radeyî êdî caran demê bîrewerîyên, nivîskar û

hunermend û wêjevanên malavayî kirî, di rojhjmêrê de nebînin, êdî li hinek kesanên hêşta zêndî digerin, bi her behaneka hebe, jêre festîvalên çandî sazbkin!

Wesa bo me xwiya dibe, kesanên di saziyên rewşenbîrî de kar dikin, berdewam nêrîna rojhjmêran dikin, kanê wê kengî bîreweriya bûn û malavayiya wêjevan û nivîskar û hunermendekê kurdî yê nasiyar were; heya haydariya berpirsîn ji xwe mezintir bikin û pêşiniyarkin, festîvalekê bi navê wî rewşenbîrê mal avay kirî sazbikin. Helbet piraniya caran berpirsên karbidest êkser pêşiniyazê qebûl dikin û bûdceka aşopî caran ji bûdca herêmê jêre terxan dikin û êdî berheviya festîvalê dihê kirin û dawiyê dihê sazkirin û êdî piraniya bûdca jêre hatî ye terxankirin, bi rêkên ne paqij û cihê gumanê, li ser heyî, di navbera hinek kesanên kêm de dihê xerc kirin.

Raste mîna li destpêkê min amaje dayê, mafê gelê me ye jî, mîna gelên cîhanê bîranîna stêrên dîroka xwe ya çand û hunerî bikin; lê ne bi vî rengî bê xwê û ji sînorê xwe yê normal derkeve. Dibe diyardeka normal be, salane du, sê festîval heke di pir biha û di giringbin û barûdux di harîkarbin, bîranînên weha bihêne kirin. Lê bi mercekî bi şêwekî pakij û rêk û pêk berhevî li dûv bodceka normal, jêre bihêt kirin.

Ez pişka bitir ji vê berpirsayetyê di êxme stûyê karbidestên saziyên çand û hunerê desthelata herêma Kurdistanê. Çunkî her ewin berpirsên êkê û dawiyê dişên rêkxistinekê bêxine vê diyarda nerênî û hinek mercan jêre danin ko êdî sînorekî bo saz kirina festîval û bîranîn li ser pişka bûdca desthelata herêma Kurdistanê